 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 32

# Çêkirina Dîrokên Efsanewî li Rojhilata Navîn

Gelên Rojhilata Navîn ne tenha belaya siyasetmedarên zordar li wan geriyaye; ne jî tenha belaya oldarên ayînî yên paşverû û kevneperest, ewên ku bi navê cîhadê gelan dajon qirkirina mirovan û kavilkirina welatan; hên bi ser da, belaya hin "dîroknasan" jî li wan geriyaye, ewên ku dîrokê li gor daxwazên xwe diguhêrin û ji gelên xwe ra bîreweriyeka derewîn çêdikin. Hinek ji wan di vê rê û şopê da gihîştine asta kesên ji şêtbûnê êdî dest têye ser wan. Va ne di vî warî da çar embaz (model):

## Yekem - Embaza farisî:

Faris di destpêkê da gelekî revend û koçber bû. Ew di sedsala 8-an b.z. da gihîştine bakurê padîşahiya *Îlam*. Ew ser bi padîşahiya **Madan** bûn, wan sûd ji vê yekê wergirt û dema ku padîşahiya *Îlam* lawaz bû, herêmên wê xistin bin desthilata xwe. Di pey ra, *Gohreşê Duwem* û serokleşkerê Madan *Harpag* dek û dubareyek li dijî padîşahê Madan *Ezdehak* (*Astiyag*) lidarxistin û, di sala 550-î b.z. da padîşahiya Madan dagîr kirin, emperatoriyeka nû avakirin ku di pey ra çarçewa wê ji sînorên Çînê heya bi kenarên Bosfor dirêj dibû[1].

Lê belê dîroknasên Farisan yên kevin gotûbêjeka din dibêjin. Ew angaşt dikin ku papîrê Farisan yê yekem "*Ciyomert*" (*Giyomert*) padîşahê mirov û meçêtiran (ins û cinan) bû û neviyê wî *Hoşeng* wek yekem kes agir vedîtiye û ku *Tehmort* kurê *Hoşeng* şerê meçêtiran (cinan) kiriye û pir kes ji wan xistine zîndan û girtîgehan. Meçêtiran ji ber rizgarkirina xwe va ew bi sîh zimanî hînî nivîsandinê kirine. Bi vî awayî nivîsandin wek cara pêşîn hatiye vedîtin. Û dîsa angaşt dikin ku *Cemşîd* kurê *Tehmort* yekem kes bûye ku çek durist kirine û bajar avakirine, û di dema wî da *cejna Newrozê* hatiye naskirin[2].

Dîroknasên Farisan jînenîgariya padîşahên xwe bi zimanê pehlewî xistine pirtûkekê bi navê "*Xuday-Name*", yanê *nameya Xwedayî* û wisa dîroka xwe bi boyaxeka xwedayî boyax kirine. Piştî ku Ereban di sala 651-an z. da emperatoriya Farisan hilweşand, di pey ra dîroka xwe ya efsanewî careka din vejandin. Nivîskar *Ibin El-Muqefe'* (*Rozbe*, sala 759-an miriye) pirtûka "*Xuday-Name*" ji pehlewî wergerande erebî. Paşê, *Fîrdewsî* (sala 1020 miriye) naveroka wê bi helbestî kir dîwana "*Şahname*"[3].





## Duwem - Embaza aşûrî:

*Aşûrî* gelekî têkile ji *Amûriyan* (*Babiliyan*), xwediyên çandeka biyabanî, û ji *Sûbaran* (şaxek ji pêşiyên Kurdan), xwediyên çandeka çiyayî, pêkhatine. Dîrokzan *Hary Sags* di vê mijarê da dibêje: "**Em tenha hin tiştên pir biçûk li ser Aşuriyan pêş dawiya hezarsala sisêyan dizanin**"; yanê pêş 2000 sal b.z. Hin *Amûriyan* di dema padîşah *Şemşî-Adadê Yekem* (Shamshi Adad I) (1813 - 1781 b.z.) da herêma *Sûbartû* dagîr kirin. Padîşah "*Aşûr Ûbalîtê Yekem*" (*Ashur Uballit I*) (1365 - 1330) yê pêşîn bû ku peyva "*Aşûr*" wek navê dewleta xwe bi karaniye. Heya wê hîngê navê kevin "*Sûbartû*" bû[4].





Lê belê dîroknivîsên *Aşûriyan* angaşt dikin ku dîroka gelê wan vedigere sala 4750 b.z. û ev mêjû kirine destpêka dîroka aşûrî. [Yanê li gor wan, em niha di sala 6765-an aşûrî da ne]. Wan cejna "*Ekîto*" ya sûmerî wergirtin û angaşt kirin ku ew cejneka aşûrî ye. *Dr. Hamed El-Beyatî*, niwênerê Îraqê li ba Netewên Yekbûyî bi vê tezwîrê hate xapandin û di rûniştina neteweyên Yekbûyî da roja 21.03.2013 Aşûrî bi yada cejna *Ekîto* (cejna sersala aşûrî) pîroz kirin, da ku ji cîhanê ra bêje: Binêrin - em îraqî - çiqas di dîrokê da kevnin û em çiqas payebilindin!




## Sêyem - Embaza keldanî:


Kaldu / Kaldi miletekî revend û biyabanî ye, ew vedigere ser hin êlên *Aramiyan* ku ji biyabana Cezîra Erebî koçkiribûn û di navbera sedsala 14-an b.z. da li ber kenarên çemê Ferat li başûrê Mêzopotamiya (Îraqa niha) bi cih bûbûn. Di pey ra ew heya bi kendava sûmerî (farisî) belav bûne. Di sedsala 7-an b.z. da padîşahiyek avakirin ku bi navê *Padîşahiya Babilî Nûjen* hate naskirin û temenê wê tenha 87 sal bûn (ji 626 heya 539 b.z.). Şeş padîşahan desthilatdariya wê kirine. Ew di dawiya jiyana xwe da kete jêr kelîja padîşahiya *Aşûr*. Paşê di sala 612-an b.z. da bi padîşahiya *Madan* ra hevpeyman lidarxist daku xwe ji bin desthilatdariya *Aşûr* rizgar bike, û di pey ra li ser destê padîşahê farisî *Gohreşê Duwem* hate hilweşandin[5].



(Padîşahiya Keldanan pêş 612-an b.z.)

Eve rastiya dîrokî. De ka niha werin em binêrin dîroknasê keldanî Amir Henna Fettûhî çi gotiye: "**Keldan ji rûniştivanên resen yên Îraqa kevinin**". Ew angaşt dike ku bajarê *Erîdû* yê sûmerî hên ji 5300 b.z. da paytextê *Keldanan* yê yekem bû, û dibêje ku nivîsîna yekem û

naskirî di droka mirovatiyê da di hezarsala pêncan b.z. da li niştecihê Keldanên pêşîn peyda bûye; hên pêş ku *Sûmerî* bigihînin başûrê Mêzopotamiya bi dora 1500 sal. Ew *Akkadiyan*, *Babiliyan*, *Aşûriyan* û *Suryanan* hemiyan vedigerîne ser "*Keldanên pêşîn*"[6].




(padîşahiya Keldanan piştî 612-an b.z.)

## Çarem - Embaza ermenî:

Dîrokzanê Egrîkî (Yûnanî) *Herodotus* (sala 425an b.z. miriye) dibêje: *Ermen* gelekî hindo-ewrûpayî ye; ew li herêma Tirakiya li Balkanan dijiya. Di sedsala 12-an b.z. da ji Tirakiya koç kirine, avtenga Bosfor derbas kirine û li herêma Firîgiya, li bakur-rojavayê Anatoliyayê di sedsala 8-an b.z. da bi cih bûne. Di pey ra di dawiya sedsala 7-an b.z. da ber bi rojhilat da çûne herêma Ûrartû (warê *Xaldiyan* - şaxek ji pêşiyên Kurdan) û ew welat xistin jêr desthilatdariya xwe piştî ku bi sedema talankirina Hitîttî ew welat ji hev ketibû.

Navê *Ermenan* wê hîngê *Hay* bû û ji welatê wan ra *Hayestan* hate gotin. Farisan nav lêkirine *Ermîniya* (*Arminia*). Helbete, gelê *Hay* û gelê resen yê *Ûrartû* (neviyên *Horiyan*) û hin *Hitîttên* wan deveran, tev li hev bûne. Di pey ra li wê herêmê neteweya ku bi navê "*Ermenî*" hate naskirin, pêkhat. Û eve sedema lihevçûna (teşabiha) navbera Kurdan û hin Ermenan di warê sîma û pergala mirov û di warê mûzîk û hin stranên gelêrî da[7].






Dîrokzanê ermenî **Mevses Khorenatsi** (410 - 490 z.) angaşt dike ku xwedawendên pêşîn destpêka cîhanê bûn, ji wan hin dêwên gewre û bihêz û bejindirêj hatine afirandin. Yek ji evên destpêkê *Hayk* bûye ku vedigere ser *Yafês* kurê *Nûh*. Ev kes bi qehremaniya xwe navdar bûye, bi avêtina tîr ji kevan pispor bû û peyayekî rimgerîn bûye. Ew li bajarê *Babil* dima. Di pey ra ew ber bi bakur va hat û li gel zarok û neviyên xwe û êla xwe ya ji 300 kes gihîşte başûrê *Gola Wanê*; rûniştivanên resen xistin bin desthilatdariya xwe, û ev welat ji kurê xwe *Aramaniak* ra kir maf û mîras.




Movses dîsa angaşt dike ku *Hayk* û hin kesên ji êla xwe, kelîja desthilatdariya xwe ber bi bakurê rojava va fireh kirine û li cihekî bilind bi cih bûne ku nav lêkirine *Hayk*. Movses bi ser va zêde dike û dibêje: "**Eve ew Hayk, papîrê neteweya ermenî... Aram sînorên padîşahiya ermenî bi hemû aliyan da fireh kirin. Em li ser zemînê bi navê wî hatin binavkirin. Yûnanan nav li me kir "Armîn" û Faris û Aşûriyan nav li me kirin "Armenîk**"[8].

Ev tenha çend embazin ku çawa bûyerên dîrokî bi awayekî ne durist û tezwîrkirî li Rojhilata Navîn hatine ristin. Nimûneyên wek van di dîroka Ereb û Turkan da jî hene. Arîşe û

pirsgirêka mezin ewe ku ev dîrokên efsanewî di hişyariya giştî ya van gelan da bûne stûnên bingehîn, û di bîreweriya wana neteweyî da bi cih bûne, û li gor wê siyasetên xwe bi gelên cîran û hevsê ra bi rêva dibin. Piştî wê gelek zor û zehmet dibe ku tu baweiya wan bi tiştê ku rast û duriste bînî.

Me ev ambaz anîn ziman wek destpêkek ji bo lêkolîna me li ser Sûbaran. Ji ber ku ev gel yek ji qurbaniyên van angaşt û propagandayên derewîn û efsanewî ye.

Çarşemb, 04.11.2015

# Jêder

[1] Mourice Crouse: Dîroka şaristaniyan ya gelemper, 1/214. Abdulhamid Zayed: Rojhilta hemdem, rûpel 600. Muhemmed Byûûmî Mehran: Dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 460.

[2] El-Firdewsî: Şahname, rûpel 5 - 9.

[3] Emin Ebdulmecid Bedewi: Gerek di Şehnameya Firdewsi da, rûpel 7 - 11.

[4] Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 30. Muhemmed Byyûmî Mehran: Dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 335, 344. Amer Hanna Fetûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 105.

[5] Hasan Mihemed Muhyedin Se'di: Di dîroka Rojhilata Nêzîk ya Kevin da, rûpel 199. Remedan Ebdeh Eli: Dîroka Rojhilta Nêzîk ya kevin û şaristaniyên wê, rûpel 230. Muhemmed Byûûmî Mehran: Dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 316 - 317, 348, 438.

[6] Amer Hanna Fetûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 14, 32, 190.

[7] Merwan El Mudewer: Di nava dîrokê da, rûpel 102 - 109.

[8] Movses Khorenatsi. Dîroka Ermenan, rûpel 37, 38, 45 - 46.